**Dayîk, bav an sergêrê delal,**

Xwedîkirina zarokan hertim karekî hêsan nîne. Yek ji erkên herî girîng ên me li Navenda Saxlemiya Zarokan (BVC) alîkariya bo malbatan bona pêkanîna rewşeka ewleh li nav malê bo zarokan e. Ji ber vê yekê em ji tevahiya malbatên ku serî li me didin ra pêşniyar dikin ku bersiva van pirsan bidin. Pirs li ser tiştinan in ku renge tûşî gellek malbatan bên. Pirs li ser we û zarokekî ye ku îro serî li Navenda Saxlemiya Zarokan dide. Tijîkirina formê bi dilxwazî [ xwebexş e û hûn dikarin beşek an tevahiya pirsan bibersivînin an bersiva tu yekî nedin.

Cinsiyeta zarok:___________ Temenê zarok: _____________Sal ____________meh Cinsiyetê kesê/a bersivdêr: _________

□ Belê □ Na Gelo hûn dizanin dema ku zarokê we tiştekî jehrî daqurtandiye, divê bi çi hejmarê ra têkilliyê bigirin?
□ Belê □ Na Gelo li nav mala we pergala hişyariya dûkelê heye?
□ Belê □ Gelo li nav kesên ku li mala we da dijîn, kesek cigareyê dikişîne?
□ Belê □ Gelo di heyama yek sala bihurî da qewimiye ku dilgiran bin diravê we têra xercên we di mehekê da nake?
□ Belê □ Na Gelo di heyama yek sala bihurî da qewimiye ku hûn nekarin xwarin an kincên pêwîst bo zarokê xwe bikirrin?
□ Belê □ Na Gelo we di heyama çend mehên dawî da hesta cemidîn û qerisîn, bêhndaketin an bêhêvîtiyê kiriye?
□ Belê □ Na Gelo di mehên dawî da qewimiye ku derheq tiştên ku bi giştî ji wan hez dikin an meyl û meraqa we li ser wan heye, hest û meraqa we ya kêmtir hebe?
□ Belê □ Na Gelo bi giştî hesta bêhedarî û strêsa giran li we peyda dibe?
□ Belê □ Na Gelo hûn hest dikin ku kontrolkirina zarokê we bi awayekî taybet dijwar e?
□ Belê □ Na Gelo we jibo pêkanîna karên zarokê xwe hewcetî bi alîkariyeka zêdetir heye?
□ Belê □ Na Gelo hûn ji vê yekê ku kontrola xwe derheq zarokê xwe ji dest bidin, nîgeran in?
□ Belê □ Na Gelo hevjînê niha yan berê li nav jiyanê heqaret û biçûkatî li we kiriye an hûn xistine bin serdestiya xwe, bi awayekî ku wek mînak diyar bike ku dikarin bi çi kesî ra rabin û rûnin, danûstandinê bikin, çiqas dirav di destê we da hebe an îzna we heye ku çi cûre kincan li ber xwe bikin?
□ Belê □ Na Gelo hevjînê niha yan berê li nav jiyanê gef li we xwariye, hûn têhildane, li we daye, daye ber pêhnan an her cûre ziyaneka fîzîkî ya din li we xistiye?
□ Belê □ Na Gelo tu qet ji hevjînê xwe an kesek din li nav xizmetên we tirsiyayî?

Bi gitşî çend caran vexwarinkên elkolî vedixweyî?

□ Qet □ Di mehê da carekê û kêmtir □ 2-4 caran di mehê da □ 2-3 caran di hefteyê da □ 4 caran an pirtir di hefteyê da

Di rojeka asayî da ku elkolêî vedixweyî, çend vexwarinkên elkolî vedixweyî? (Serî li Mînaka Jêrê bide)?

□ 1-2 □ 3-4 □ 5-6 □ 7-9 □ 10 an zêdetirê

Bi giştî çiqas diqewime ku bi carekê ra şeş vexwarinkên elkolî an zêdetirê vexweyî?

□ Qet □ Kêmtir ji carekê di mehê da □ Di mehê da carekê □ Carekê di hefteyê da □ Her rojê an hema bêje herrojî




□ Belê □ Na Gelo pirsgirêkeka din heye ku bixwazî îro jibo wê yekê alîkariyê werbigirî?

**Gellek Sipas!**

Kurmanji